



KT

**Zanîngeha Mardîn Artûklûyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî
Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

ARGO DI DEVOKA AMEDÊ DE

Mehmet EKEN

17721025

Şêwirmend

Dr. Öğrt. Üyesi Necat KESKİN

Mêrdîn 2018

KT

**Zanîngeha Mardîn Artûklûyê
Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê
Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî
Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

ARGO DI DEVOKA AMEDÊ DE

Mehmet EKEN

17721025

Şêwirmend

Dr. Ögrt. Üyesi Necat KESKİN

Mêrdîn 2018

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “ARGO DI DEVOKA AMEDÊ DE” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezin/projenin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezin/projenin tamamı her yerden erişime açılabilir.

26/05/2018

Öğrencinin Adı Soyadı

Mehmet EKEN

KABUL VE ONAY

Mehmet EKEN tarafından hazırlanan Argo Di Devoka Amedê de adındaki çalışma **YÜKSEK LİSANS PROJESİ** olarak kabul edilmiştir.

Dr.Öğr. Üyesi Necat KESKİN

NAVEROK

KURTE	I
ÖZET	II
DAXUYANÎ	III
BEYANAT	IV
PÊŞGOTIN	V
KURTEBÊJE	VII
DESTPÊK	1
1. Mijar û sînorên Mijarê	2
2. Armanc û Giringiya Xebatê	2
3. Rêbaz.....	3
4. Pirgirêkên Mijarê	3
BEŞA YEKEM	4
ZIMAN, DEVOK Û ARGO	4
<u>1. ZIMAN</u>	4
1.1. Zaravayên Kurdî Yên Tên Bikaranîn	4
2. DEVOKÊN KURDÎ	4
3. PÊNASEYA ARGOYÊ:	6
3.1. Diroka peyva argoyê:	6
3.2. Argo di kijan beşa folklorê de cih digire?	7
BEŞA DUYEM	8
ARGO KU DI DEVOKA AMEDÊ DE TÊN BIKARANÎN	8
<u>1. Agahiyên Derbarê Sehayê Lêkolînê</u>	8
1.1. Argo û peyvên argoyê ku li Amedê tên bikaranîn	9
ENCAM	27
ÇAVKANÎ	28

KURTE

Her çandek û deverek xwediyê argoyên xwe yên taybet in. Ev argo li gor şert û mercên dîrokî, erdnîgarî, civakî, folklorî û aborî, di nav salan de rengê xwe girtine û heya îro hatine. Ev argoyên ku tên bikaranîn bi giştî bo deverên kurd lê dijîn, taybet ji bo devera Amed jî derbas dibe. Ev çanda argoyên ku bi guherîneke berdewam digihîje roja me, ji ber pêşketina televizyon, radyo û jiyana modern hêdî hêdî winda dibe. Divê ev argoyên ku li ber mirinê ne, bêne tespîtkirin, danasîn û ji bo dahatûyê bêne neqilkirin. Ji bo vê jî em ê di vê xebata xwe de li bajara Amedê argoyên ku tên bikaranîn bi alikariya pirtûk, stran, helbest û kesayetan kom bikin. Piştê komkirina argoyan em ê wateya wan li hemberê wan binivîsînin. Beriya wan jî em ê li ser erdnîgarî û dîrokî ya Amedê agahiyan bidin paşê wateya ziman, zimanê dayîkê, zarava, devok werin dayîn û bi mînakên xebat were xurt kirin.

Peyvên Sereke: argo, Amed, devok, ziman, zimanê dayîkê, zimanê zikmakî, zarava,

ÖZET

Her kültür ve bölge kendine has argolara sahiptir. Bu argolar tarihi, coğrafî, sosyal, folklorik ve ekonomik şartlardan dolayı yıllar içinde rengini almış ve günümüze ulaşmışlardır. Bu kullanılan argolar Kürt bölgelerinde var olmakla birlikte özellikle Diyarbakır şehrinde kullanılmaktadır. Bu argo kültürü ki sürekli değişim ile günümüze gelirken televizyon, radyo ve modern yaşamın gelişmesinden dolayı yavaş yavaş kaybolmaktadır. Bu ölüm döşeginde olan argo kelimelerin tespit edilip açıklandıktan sonra gelecek kuşaklara nakil edilmelidir. Bu yüzden de bu çalışmamızda Diyarbakır'da kullanılan argoları kitap, müzik, şiir ve şahıslar aracılığıyla toplayacağız. Bu argoları topladıktan sonra anlamlarını karşılıklarına yazacağız. Bunlardan önce ise Diyarbakır'ın coğrafyası ve tarihi hakkında bilgi verip ardından dil, anadil, lehçe, ağız gibi kavramların anlamları verilecek ve örnekler ile bu çalışma kuvvetlendirilecektir.

Anahtar Kelimeler: Argo, Amed, devok, ziman, zimanê dayikê, zimanê zikmakî, zarava

DAXUYANÎ

Di amadekirina vê berhemê de min rêzikên etîka zanistî li ber çavan girtine. Heke min berhemek bi kar anîbe, teqez li gorî bendên zanistî min bal kêşaye li ser van berheman. Dîsa çî berhemên ku min bi kar anîn çî jî keresteyên ku min berhevkirîn, hingî ji min hat, min parastine, min nehêleye çî tehrîfat bigihîjin wan.

BEYANAT

Bu projenin hazırlanması ve yazılmasında bilimsel ahlak kurallarına uyulduğunu, başkalarının yapıtlarından yararlanılması durumunda bilimsel normlara uygun olarak atıfta bulunulduğunu, kullanılan verilerde herhangi bir tahrifat yapılmadığını, beyan ederim.

PÊŞGOTIN

Argo yek ji wan mijarên ku bi folklorê re girêdayî ne. Lê bi qasê mijarên din nehatiye lêkolîn kirin. Di vê xebatê de min armanc kir ku li ser argo bixebitim. Cara pêşî ev fikir ji aliye mamosteyê min ê Yilmaz Özdil ve hat gotin û ji min xwest ku ez jî fikren xwe yê cuda vegerim û li ser vê mijarê xebat bikim. Pêşî min qebûl nekir lê paşê bi alikariya hin hevalên xwe û bi destûr û rê nîşandana şêwirmendê xwe min dest bi vî karê kir.

Amed bo min bajareke efsûnî ye û hezkirina wê di dile min de wek kulîlkeke her tim geş dibe û bi bêhna xwe min aram û kêfxweş dike. Hem ji ber hezkirina xwe hem jî ji ber devlemendiya ji aliye argo ve min Amedê bi taybetî jî navçeya Surê kir cihê lêkolînî.

Ez dixwazim hinek li ser bajarê Amedê rawestim ji ber ku heke hin tişt neyên gotin ew ê mijara me baş neyê fehm kirin. Li Amedê mirovên ku bi hev re xeber didin wek gelên bajarên din dixwazin fikr û hestên xwe bi awayekî baş bînin ziman. Carna bi henekan an bi argo dixwazin hevokên xwe xurt bikin û têkîlî û axaftineke samîmî çêbikin. Wek mînak rojekê ez çûm çayxaneyekê, li hemberê min 4 mirovên bi tîmenê xwe ve kal rûdiniştin. Di axaftina wan de min rehetî ya Amedê hîs dikir, ji ber ku emrê wan ne kêmê 60î bûn û mijarên wan li ser erotîzmê bûn. Yek ji wan jî yê cem xwe re got:

" Meheme Abê careke qûna xwe nadî min.

Xalê Meheme li aliyê mêrikê ve zivirî û got:

Ez zanibim ez careke qûna xwe bidim te û ji te xilas bim, ez ê bidim te. Lê ez zanim ez careke bidim te tu careke din jî bixwazî"

Ji vê axaftinê jî tê xuyakirin ku gelên Amedê ji aliye axaftin ve gelek rihet û henekvan in. Ev kesayetîya wan karê min di vê xebatê de hêsantir kir û min demeke hindik de gelek argoyên ku li Amedê tînin axaftin kom kirin.

Di vê xebatê de gelek kes alîkariya min kir. Ji ber alîkariya wan divê ez kêfxweşiya xwe binim ziman û spasîyên xwe pêşkêş bikim. Cara ewil ez dixwazim ji şêvirmendê xwe re spas dikim. Ji ber ku şêwirmendê min mamoste Dr. Öğrt. Üyesi Necat Keskin di vê xebatê de her tim bi min re bû û kêmasîyên min nîşanê min dida. Paşê ji mamoste Dr. Öğrt. Üyesi Yılmaz Özdil re divê spas dikim lewra ev xebat fikra vê bû. Ji Kadri Mehmetoğlu, Şükrü Nart, Mevlüt Azarkan, Mehmet Emin Akbulut re jî spas dikim ji ber ku divê xebatê de gelek alîkariya wan gihişte me. Gelek argo ji me re gotin û gelek wateyên argo jî bi saya wan em hînbûn. Herî dawî jî dixwazim ji havale xwe yê hêja Hasan Filioğlu re spas bikim lewra hevalê Hesên nivîsîn min serarast kir û di nîsandina tezê de her tim alîkariya min kir.

KURTEBÊJE

amd. : Amadekar

Hj. : Hejmar

h.w.d : Her weke din

r. : Rûpel

weş. : Weşanxane

DESTPÊK

Folklor ew zanist e ku çanda maddî û manewî ya gelêrî li gorî rêbazên xwe yên taybet lêdikole, berhev dike, disenifîne, tehlîl dike û dinirxîne. Folklor ji du bêjeyên ingilîzî pêk tê: “folk” gel û “lore” zanist an jî lêkolîn.¹

Bi kurdî bêjeya folklorê tê wateya zanista gelêrî an jî lêkolîna li ser gel. Li gorî Celadet Bedirxan “folklor, zanîn an zanistiya xelkê ye”. Di zaravayên kurdî de ji bo zanista folklorê bi kurmancî “zargotin” û “zanista gel”, bi soranî “xelknasî” û bi zazakî “zanistiya şarî” tê gotin.²

Her wekî ku tê zanîn, folklor bi xwe beşek ji çandê ye. Afirandina çandê wekî çalakiya mirovayiyê bi çêkirina aletên seretayî yên keviran dest pê dike. Li gorî lêkolîn û çavkaniyên arkeolojîk ev afirandin cara yekem beriya 3 milyon salan li Rojhilata Navîna Efrîqayê dest pê kiriye. Lewra wan kevir bizanebûn bi kar anîne.³

Hemû çalakiyên jiyana gelerî mijara folklorê ne. Bi taybetî ew li ser afirandinên hevpar radiweste.⁴ Li gorî Celadet Bedirxan, “folklor tevayiya adet, çîrok û stranên milletekî ye. Ew adet, çîrok û stranên ku ji nav xelkê bi der ketine û di dora nîşan de bi ser ve ketine û gihastine nîşên nû.”⁵ Li gorî Propp, herçê çalakiyên afirînêrî yên gelan in, ew hemû folklor in.⁶

Kurd jî wek gelên din xwediyê çandê ye. Kurdan jî wek gelên din li ser folklorê xwe xebat kirine lê ev xebat têrê nakin. Ji ber ku li ser folklorê Kurdî zêde xebat ne hatiye kirin gelek tişt li ber windabûnê mane. Argo jî yek ji wan keresteyên ber windabûnê ye. Carina jî ew ne wek yên kurdî hatine berhevkirin, hatine guhertin. Wek mînak em dikarin stranên Kurdî nîşan bidin. Di salên 1926, 1938, 1967, 1976’an de ji aliyê Komelaya Tîrkiye ve li Anatoliyê hezaran stran hat berhev kirin

¹ Prof. Dr. Kadri YILDIRIM, Ramazan PERTEV, Mustafa ASLAN, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî* 2013.

² Celadet Bedirxan, “Ferhengok”, *Hawar*, j. 30, Şam, 1941, r. 759.

³ Robert Clarke, *Naissance de l’Homme*, Weşanxana Editions du Seuil, Paris, 1980, r. 28-29.

⁴ Doğan Kaya, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weş. Akçağ, 2007, Ankara, r. 327.

⁵ Celadet Bedirxan, *Hawar*, h.c.

⁶ Vladimir Propp, *Teorî ve Tarih*. Weşanên Avesta. Stenbol, 2001, r. 11.

û paşê bi Tirkî hat wergerandin. Wek mînak tenê di sala 1938' an de ji aliyê Muzaffer Sarısözen ve li bajarên Meletî, Diyarbekîr, Riha û h.w.d. nêzê 491 stranên Kurdî hat berhevkerin û bi tirkî hat îcra kirin.⁷

Ew peyv û biwejen ku hertim û li her deverê nayê bikaranîn an divê neyê bikaranîn û piranî jî ji aliye mirovên bêperwerde ve tên bikaranîn re argo tê gotin.⁸ Argo carna bi peyveke carna jî bi hevokan ve tê çêkirin. Li herêma Amedê jî argo wek axaftina rojane di nav gel de cih digirin û carna fikreke dikarin bi deh peyvên cuda bînin ziman.

Armanca vê tezê berhevkerina hinek peyvên argoyê ye ku li Amedê û bi devoka Amedê tên bikaranîn. Di folklorê de karê pêşî berhevkarî ye. Me jî bi berhevkeriyê dest bi vê xebatê kir. Li Amedê di sala 2018an de bi gelek kesan re me hevdiîn pêk anî û ji wan me peyvên argo berhevkerin û ligel wateyên wan me di nivîsandin.

1. Mijar û sînorên Mijarê

Navê tezê Argo di devoka Amedê de ye. Mijara xebatê argo ye. Ev xebat li Amedê hat kirin. Ji ber ku li ser vê mijarê zêde xebat nehatibû kirin me xebata xwe sinordar kir û me analîza argoyan çênekir û me tenê ferhengok amade kir. Me xebata xwe li Amedê kir. Dîsa ji ber hin sedeman wek aborî û dem û h.w.d. me xebata xwe bi Amedê ve sinordar kir.

2. Armanca û Giringiya Xebatê

Armanca vê xebatê wek hate gotin berhevkerin û danasîna hinek mînakên argoyê ne ku li Amedê tên gotin. Herweha amadekirina ferhengokekê jî armancake din ya vê xebatê bû. Ez hêvî dikim armanca vê berhemê gihaştibe mîrazê xwe û ji bo dahatûyê ji bo xwendevanên nû bibe çavkanîyek sîdwergirtinê.

⁷ Abdulkerim Bülbül, *Kürtçe Şarkılar Nasıl Türkçe Oldu? 9. İlonê 2011*
<http://www.derindusunce.org/2011/09/09/kurtce-sarkilar-nasil-turkce-oldu/> (10.07.2018)

⁸ Türk Dil Kurumu, Argo, 2018
http://tdk.gov.tr/index.php?option=com_gts&arama=gts&guid=TDK.GTS.5b4f169ef01200.00252042
(18.07.2018)

3. Rêbaz

Me pêşî li ser argo xebatên ku hatine kirin xwendin û ji wan sûd wergirtin. Paşê me li Amedê bi hin kesan re hevdiîn çêkirin û me ji wan argo berhev kirin. Me tiştên ku berhev kirine pêşî derbasî nivîsê nekirin. Ji ber ku divê me pêşî rastiya wan îspat bikira. Tiştên ku me berhev kirine me ji hin kesên din jî pirsî û piştê piştrastkirina wan me ew derbasi nivîsê kirin.

4. Pirgirêkên Mijarê

Pirsgirêkên ku di maweya xebatê de min rubiruyê wan bûye gihiştina wateya hin bêje û biwêjan bû. Lewra hin bêje û biwêjên ku hatine bikaranîn niha zêde nayên bikaranîn an jî wateyê wan hatine jibîr kirin.

BEŞA YEKEM

ZIMAN, DEVOK Û ARGO

1. ZIMAN

Li gorî wîkîpedîa kurdî ziman awayê gotin û ragîhandina di navbera mirovan de ye. Etîmolojîya wê pir kur e. Pêşî li ku derê peyda bû? Çawa belav bûn? Ev hemû pirs in. Li ser wan gelek minaqêşe hene. Tiştê teqez ew e ku ziman ji bo mîrovahetîyê gavê herî bilind e. Lewre Mirov bi alikariya ziman bi hev re têkilî datînin û bi alikariya ziman li hev dikin. Mirov bi zimanê hest û ramanên xwe radigihînin hev. Li ser rûyê erde gelek ziman tên xebordan. Wek mînak: Kurdî, Tirkî, Îngîlîzî, Fransîzî, Îtalî, Çînî, Elmanî, Hindî, Farisî, Erebî û h.w.d.

1.1. Zaravayên Kurdî Yên Tê Bîkaranîn

Zarava, devok an jî diyalekt ji şaxên zimên re tê gotin. Heke zimanê heremî di nava tevahiya zimên de xwedî taybeteke berbiçav be, ew zarave an diyalekt e. Bo mînak di kurdî de 5 zarava hene.

1. Kurmancî (Kurdîya Bakur/Kurdîya Jorîn)
2. Lûrî (Kurdîya Başûr/Kurdîya Jêrîn)
3. Soranî (Kurdîya Navîn/Kurdîya Rojhilatê)
4. Zazakî (Kirdkî/Kirmanckî/Dimilkî)
5. Goranî (Hewramî)

Li Amedê ji zaravayên kurdî herî zêde Kurmancî tê bikaranîn ji bilî kurmancî zaravayê Zazakî tê bikaranîn. Zaravayên Lûrî, Soranî û Goranî zêde nayên bikaranîn.

2. DEVOKÊN KURDÎ

Li gorî herêman guherînên biçûk ya axaftina zimanê ye. Ev guherîn ne qasê cudabûna zaravayan in. Kesên ku bi devoka xwe diaxifin dikarin bi rehetî devokên din jî fehm bikin tenê ji aliyê bikaranîna tîp û peyvan ve hin guherîn derdikevin holê

ew jî di demeke kurt de bi rehetî tîn fehm kirin. Bo mînak di kurdî de zaravaya mezintîrîn kurmançî ye û pîranî ya kurdên Amedê bi zaravaya kurmançî xeber didin. Di zaravaya kurmançî de devokên ku tîn axaftin li jêr bi cihên ku tîn axaftin ve hatine nişandan:

1.Kurmançîya Rojava: Kurmançîya alîyê rojavayê Çemê Feratê ye. Ji vê devokê re Berfiratî jî tê gotin. Ji herêma Efrînê dest pê dike heta Meletîyê (Riha, Mereş, Dîlok) tê axaftin.

2.Rewendî / Bayezîdî / Serhedî: Kurmançîya Serhedê ji Erîwanê bigire, Qers, Agirî, Wan, Mûş, Erzerom, Erzinganê heta herêma Şikakîyan tê axaftin.

3.Şikakî: Cîwarên di navbera gola Urmîyê (Mako, Xoy, Qotir, Dîlman, Saqiz, Serdeşt, Banê û Bokan) Gever, Elbak, Şemizînan û li herêma Navşarê tê axaftin.

4.Sincarî: Li herêma Şêxanê û çîyayê Sincarê tê axaftin.

5.Silîvî-Kîkî-Millî: Li Amedê, hinek deverên Mêrdînê, Riha û Xarpêtê tê qisekirin.

6.Bofî (Bohtanî): Li bakurê Zaxoyê, Şirnex, başûrê Behra Wanê û hinek deverên Bidlîs, Sêrt, Êlih û Mêrdînê.

7.Cizîrî: Li Cizîrê û deverên Mêrdînê, Midyad, Nisêbîn, Qamîşlo, Şengal û Amûdê tê xebirdan.

8.Bahdînî (Bahdînanî): Li Duhokê û hinek deverên başûrê Botanê, Zaxo, Akrê, Zêbar û Amedîye tê axaftin.

9.Hekarî (Şemzînanî-Şemzîni): Li Hekarîyê (Nehrî, Oremar, Gever) û li hinek deverên Şirnexê tê axaftin.

10.Torî: Li deverên Kercewsê, Kerboran û Midyadê tê axaftin.⁹

⁹ Nasir Kemaloğlu, *Zaravayên Kurdî*, BasNews-Nûçe, Hejmar:92, <http://candname.com/zaravayen-kurdi-2/> (04.06.2018)

3. PÊNASEYA ARGOYÊ:

Argo ew bêje û biwêjên ku ji aliye komekê ve tên bikaranîn û wateyên wan tenê ji aliye wan tên zanîn. Bi gotineke din hin peyvên rojane ku ji aliye hin kesan ve bikaranîna bi wateyeke cuda ne.¹⁰

Bi gotineke din ew zimanê ku di gel de ji zimanê rojane cudatir e lê ji zimanê rojane hatiye afirandin û ji aliye her kesê ve nayê fehm kirin¹¹

Hulki Aktunç jî dibêje ku argo girêdayî zimanekî ye lê watêya wan tenê ji aliye komek an hin kesan ve tên zanîn. Di nav zimanê rojane de wek zimanekî taybet e.¹²

Argo li gorî herêman û li gorî jiyana merivan an gelan tên guhertin. Argo ne dijûn in lê carina dijûn jî wek argo tên bikaranîn. Her dever xwediyê taybetmendiyan cuda ne û li her deverê bikaranîna ziman ji deverên din cudatir e. Ji ber vê yekê jî, di jiyana rojane de hin taybetmendiyan axaftinê derdikevin holê û hin peyv an hevok hene ku di axaftin de carna di navbera du kesan de jî bi şikleke cuda tên bikaranîn. Ji ber ku taybetiya cîh û deverê xweser dike, dibe ku ji aliyan kom û civatên din ve baş neyê fehm kirin. Ji ew peyv an hevokên ku di axaftinê de tên bikaranîn û tenê ji aliyan hin kesan ve tên fehm kirin re argo tê gotin.

3.1. Diroka Peyva Argoyê:

Koka peyvê Fransîzî ye û ji peyva argot tê. Etîmolojîya peyvê digihije sedsala 17 an. Lê ev peyv di sala 1740'an de ketiye ferhanga Akademîya Fransayê. Bere argo dihat wateyên wek 'Seneta dizitî', 'Esnafa parsekî'. Wateya xwe ya niha di sala 1690 'an de dest xistiye.¹³ Di kurdî de ji bo peyva argoyê peyven wek çepel, amiyane, firûmaye, pespaye, tiredînkî jî tên bikaranîn.

¹⁰ Murat Akıncı *Açıklamalı Edebiyat Terimleri Sözlüğü*, 2007, <https://www.turkedebiyati.org/argo-sozlugu.html> (05.06.2018)

¹¹ Ana Britanicca Genel Kültür Ansiklopedisi, c. 2, r. 266

¹² Hulki Aktunç (1998), *Türkçenin Büyük Argo Sözlüğü*. İstanbul: Yapı Kredi Yayınları.

¹³ Sevgi Ekicigil *Türk Edebiyatında Argo*, 2014, <http://www.eskimeyenkitaplar.com/turk-edebiyatinda-argo/> (05.06.2018)

3.2. Argo Di Kijan Beşa Folklorê De Cih Digire?

Alan Dantes di gotara xwe ya bi navê ‘‘Gel kî ye ?’’ de dibêje ku argo binbeşên zanista gel e14û argoyê wek binbeşa vegotinên devkî dide nişandan.

Doç. Dr. Suavi Aydın binbeşên vegotinên devkî wiha dide nişandan.

1. Mît
2. Efsane
3. Destan
4. Masal
5. Çîrokên Gelêrî
6. Biwêj
7. Gotinên pêşiyar
8. Dijûn
9. Argo
10. Sond xwarin
11. Silav li hev kirin
12. Leqeb
13. Dîrokên Devkî
14. Helbestên Gelêrî¹⁵

Di mînakên de jî tê xuyakirin ku Argo jî beşek ji beşên folklorê hatiye hesabandin û wek ji binbeşên Vegotinên Gelêrî hatiye qebûl kirin.

¹⁴ Öykü Terzioğlu *Anonim Bir Halk Edebiyatı Ürünü Olarak Argo*, 2006, r.102 <http://www.millifolklor.com/PdfViewer.aspx?Sayi=71&Sayfa=109> (17.07.2018)

¹⁵ Doç. Dr. Suavi Aydın *Halk Bilimi Sözlü Anlatımla*, 2009, T.C. Kültür Ve Turizm Bakanlığı Türkiye Kültür Portalı Projesi https://www.kulturportali.gov.tr/Common/DownloadFile.aspx?f=1.SzlAnlatmlar_20151230104856114.pdf (17.07.2018)

BEŞA DUYEM

ARGO KU DI DEVOKA AMEDÊ DE TÊN BIKARANÎN

Argo di nav beşên vegotinên Gelêrî de cih digire û di jiyana rojane de gelek tê bikaranîn. Ji ber ku ji aliye her kesî ve nayên fehm kirin ew jî argoyê bo me taybetmentir dike. Li Amedê jî hin bêje û biwêj tên bikaranîn ku wateyê wan ji aliye her kesî ve nayên zanîn. Di nav gelên de li ser argo hin xebat hatine kirin. Hin gotar, tez hatine nivîsîn ku jixwe ji bo çavkanî me ji wan jî sûd wergirtin û bo çavkanî nişandan. Di nav kurdan de heta niha xebateke wiha rêk û pek ku li ser vê mijare nehatiye çêkirin.

Armanc tezê argoya di devoka Amedê de tên bikaranîn ji windabûnê xelas kirin e. Ji ber vê daxwazê jî li ser beşek ji beşên folklorê Kurdî xebat hat kirin. Argo di axaftina gelan de ciheke cuda digire, ji ber ku di bikaranîna argoyan de parvekirina taybet hene, ev jî argo bo me şîrîntîr û samîmî dikin. Elbet argo piranî xwedîye wateyên xirab in lê ev nayê vê wateyê ku hemû wilo ne û em li ser wan xebat çênekin. Li jêr jî me ferhengokek amade kir lê gelek kêmasîyên me jî derket holê. Ji ber ku me negihişt wateya hin argoyan, erê di nav gel de hatine bikaranîn, hin ji wan jî hîna jî tên bikaranîn lê wateyên wan baş nayên zanîn. Kêmasîyek din jî ew e ku me analîza wan nekir, dema bikaranîna wan, ji bo çî tên bikaranîn û h.w.d nişan nedan ji bo wê jî pêşerojê de divê xebateke din were kirin.

Agahiyên Derbarê Sehaya Lêkolînê

Di nav bajarên mezin yê Tirkîyê de di rêza 12. de cih digire. Li gorî daneyên 2018'an serjimara Amedê.1699.901 e. Aqara wê 1.516.200,00 km²ye. Bilindayîya wê 674 metre ye.¹⁶

¹⁶Diyarbakır İl Kültür Ve Turizm Müdürlüğü, Diyarbakır, Diyarbakır, 2018
<http://www.diyarbakirkulturturizm.gov.tr/TR.56880/genel-bilgiler.html> (17.07.2018)

Navê Amedê ya kevintirîn li gorî çavkanîyên Asurîyan Amidî an Amedî bû ye. Li gorî bawerîyê ev nav ji Hurriyan(Subaruyan) maye. Piştê fetihkirina misilmanan qewmên Ereban li Amedê bi cih bûne. Ji wan qewman yek jî malbata Bekîriyan e. Piştê bi cih bûna malbata Bekirîyan ji Amedê re Dîyar-i Bekr jî hatiye gotin. Di dema Osmanîyan de jî Dîyar-i Bekr wek Dîyarbekîr hatiye bikaranîn. Navê Dîyarbakîr jî bi xwesteka Atatirk di sala 1937 an de hatiye dayîn.¹⁷

Amed ji ber ku bajareke kevnare ye em dikarin rastê gelek şopên gelên cuda û devletên cuda bîn. Hurriyan, Mitaniyan, Asurîyan, Urartu, Med, Pers, Tigran, Roma, Bîzans, Sasanî, Mervanî, Selçukîyan, Eyyubî, Artuklu, Moxol, Akkoyun, Osmanî h.w.d. li Amedê cih bûne¹⁸

Wekî li jor hatiye diyarkirin gêl û devletên cuda li Amedê bi cih bûne lê niha li Amedê Kurd xwedîyê hejmara herî zêde ne. Ji bilî Kurdan, Tirk û Ermen jî niha li Amedê dijîn. Li Amedê jî niha em dibînin ku çend zimanên cuda tên axaftin ji wan zimanan jî zêdetir zimanê Kurdî û Tirkî tên axaftin. Axaftina zimanên din wek zimanên Suryankî û Ermenîkî çiqas diçe ber bi kêmahiyê ve diçe. Herwiha ji ber sedemên konjoktruel û sîyasî her diçe axaftina bi Kurdî jî kêmbibe. Herçiqas kêmbûnek berbiçav be jî, ji aliyê gel ve bi temamî nehatiye terk kirin û bandora wê ya li ser gel aşkere xûya dike.

Di nav Kurdî de jî du zaravayên Kurdî tên axaftin yek ji van Kurmancî ye, ya din jî Zazakî ye. Di nav herdû zaravayan de jî zêdetirîn kurmancî tê axaftin.

1.1. Argo û peyvên argoyî ku li Amedê tên bikaranîn

A te reş e a wî binê wî sor û keleş e: Yanî tê wateya tu ji wî nebaştir î. Ew jî wek te ye.

Agir di qûna te da ye: Kesên ku li cihê xwe nasekîne

¹⁷Prof. Dr. Yusuf Kenan Haspolat *Diyarbakır Sosyokültürel Tarihi 1*, Dicle Üniversitesi, Diyarbakır 2013 r.4

¹⁸Haspolat *D. S. T. 1* r.5

Akko: qijik

Ala sahan: Ha ji te re

Allah îni şaşirma: Ji kesên piştê lêxistinê hînek ji hiş diçin re tê gotin.

Allah`in ataşî: Ji kesên nerehet re tê gotin.

Anaçîkîfayto: Zarok dema çêra dîkin dibêjin.

Anqût: ehmeq

Apê hecî teqlecî: zarokên Amedê ji bo hêrskirina ihtîyaran dibêjin.

Ardan vêrmax: Tê wateya lêxistin û kutanê

Arê: kesên ku pir digîrî

Arpacî: diz

Arut: komir

Aşefçî: bexçevana jin

Awêl awêl bakmax: mîna bêaqîlan mêzekirin.

Awêl: ker, bêaqîl, aqilsivik

Ayyareci: Pozneşewitî, şelaq

Bêmhne: tê wateya xelet fem neke.

Bemrat: ji kesên xemgîn re tê gotin

Bêmrês:

Bênamus: kesên ku namisa wî tune.

Beraz: ajalek(xînzîr, wahş)

Berdan berdan olmax: di karekî de nayê zanîn ku kê çi karî dike, tevlihevbûna kar

Berde bine te erd e: ji kesên zêde derewan dikin re tê gotin.

Bereday: ji kesên kêrê tiştêkî naynê

Bettal: bêkar

Beyno: xurifî, gêj

Bibi: met, metik

Bilo: organê cinsî yê kurikên biçûk

Biqirtîk: kesên ku qama wî ne bilind e. Qinik .

Bire mîn ê elemyon: ji hevalê ku zêde nesaxlem re tê gotin.

Boran: kevok

Boranhane: cihên ku kevok têde tên xwedî kirin

Bozo: ji bo xerîban tê bikaranîn

Burnî cix cixadir: bêar, bêşerm

Cacix olmak: ji kesên tevî her tiştî dibin re tê gotin.

Cazu: efsun, sihir

Cehdî: cazî, pîresêr

Cehnêma te: bicehime, biteqize

Cığcığa: folyo

Cilq: kesên ku zêde civik in.

Cinabet: bêtalih, bêşens

Cirdon: mişkê mezin e û carna ji bo hin kesan jî tê bikaranîn

Cizgir: çîngene, mirtiv

Çem û çem: dema tişteke ji dest diçe tê gotin.

Çepal: ji kesên xwe pir kirêj dikin re tê gotin.

Çirîg olmañ: kesên ku hebûna wan nayê tê wateyê, kesên nelazim

Çiço: memik

Çil etmax: -

Çilik: organê cinsî yê jinan

Çillaqa: ji kesên ku zêde xeber didin re tê gotin. Geveze ¹⁹

Çingene: mirtiv, qereçî

Çirtik: dilsivik, ji bo jinan tê bikaranîn

Çirto: dilsivik, ji bo mêran tê bikaranîn

Çûkûz: pîntî, çepel

Çutqafa: ji kesên ku mîna serxweş re tê gotin

Dalyarak: henekvan, şeqlevan

Daşaxlî: ji kesên ku biqewet e û zêde natirsin re tê gotin.

Dawar: ji kesên ku zêde biqewet in re tê gotin.

Dehşik: kurî, sîp, dehş

Dekbaz: fêlbaz, hîlebaz

Delî Yaşo: navê dinekî ye lê din av hevalan da bo henek tê bikaranîn

Dellek: lîfikvan

Derman îçmax: esrar kişandin

¹⁹ Mustafa Gazi, *Diyarbakır Türkçesi Memleketten Êlesine Yansımalar*. Do Yayınları, 2006 r.36

Deşik oğlî deşik: tê wateya kurê kerê

Devçadir: kesên ku gotin di devê wan de nasekînin

Devo: kesên ku pir xeber didin

Devşorbe: gêj, ji kesên ku zêde tişt nikarin veşêrin re te hotin

Deyaz: berçem, devçem

Deyyus: ji kesên ku ji fêşkên jina xwe re denge xwe nakin re tê gotin.

Dingilafîstan: çingletûz, zirnazîq, tehterewan

Diyaza: xaltî

Doxinsist: kesê ku dixwaze bi gelek kesan re têkiliyên cinsî bike.

Efrût olmax: hin afirandiyên aşopî anku çîrokî

Ehmeq: ker, aqilsivik

Elelok gîbî qabarmax: kesên ku xwe zêde hêrs dike.

Emî toton yesîn: bila apo qûna te bixwe. Dema kêfa kesî ji kesekî din re were ev gotinê dibêje.

Errik: erik! yah!

Eşkene: Ava goşt

Evare: beredayî

Evdal: kepaze, şerpeze

Ewdo: gêj, ehmeq

Eyyare eyyare anlatmax: -

Eyyy: kerihin, kerixîn

Fesad: gelacî

Feş: kesên ku ji rê derketî re tê gotin. Tevgerên feşitî dikin.

Fetbaz: baraz, fêlbaz

Firlama: mizawir (ji bo kesên nehs û bêar), pîç

Fiş etmax: fişkirin, xinckirin

Firfira olmax: -

Fisek: tirsonek

Fît olma: ji hev safî bûn

Fitos: jina ku pir xwe fitos dike û modayê taqîb dike

Forta davêje: xwe qure kirin

Gamêş: ajalek, ji kesên qelew re tê gotin.

Gawur: bêhman, nemisilman

Geda: sêvî, yêtim

Gedê bajêr: ji zarokên surîçî re tê gotin.

Gêj: bêhiş, ne li ser hişên xwe

Gelacî: fesad

Genî: pîs, gemarî, qirêj

Gerok: ji kesên ku zêde digerin re tê gotin

Gevşek: ji mirovên nermîsankî re tê gotin.

Gezep: zarokên nerihet

Go mertal: wateya wê nehat dîtin

Golik: ji zarokên qelew re tê gotin.

Gopo: ji kesên ku hinarikên wî/ê gingirî ne re tê gotin.

Gora mum dîkmex: -

Goşto: ji kesên pir qelew re tê gotin

Gundî: cahil, nezan

Gunehê gelmax: guneh pê hatin

Gûyo: ji gû tê û ji mêran re tê gotin.

Hala hala hêy: ji kesên hemberî hêrs bikin tê gotin

Hamşo: evdal, ker, xêv

Hebeş: şîşko, qelew, bêşimşat

Hebleme: kesên kuz û tîn xapandin, sef, xêf

Hebşî: kesên ku bêhişker difiroşin

Hello baban kello: zarokên amedê ji bo zarokên din eciz bikin dibêjin

Hemam oxlanî: îbne

Henekçî: kesên ku henakan dîkin

Herbende: derbeder

Here qûna xwe bide: tê wateya tu nikarî vî karê bikî

Here qûna xwe bişo: tê wateya tu nikarî vî kare bikî

Heso: kesên ku tiştên baş dîke

Hespê bûkê: kesê ku kire ti tiştê nayê

Heyvo: ker, ehmeq, saf

Hirçik: rût û repal, firfat

Hillo: ji bo zarokên şîrîn tê bikaranîn

Hillopis: ji bo zarokên şîrîn tê bikaranîn

Hirpo: zibidi, qeşmer

Hirtiko: xenoq, xeneqîtik

Hiko: Navê dînekî ye û ji kesên ku serê wan biçûk in re tê gotin.

Hilafsız: bi rastî, rastane

Hirçê qûn pirç:

Hirço: ji mêran tê gotin tê wateya hirçê.

Hişk etmax: tê wateya lêxistinê.

Hoho: kerixîn

Horozik: kuxik, kux

Hotir: ji ew keçikên ku porêwan vekirî û porên wan belavelane re tê gotin.

Hunnîq olmax: pir xwêdan dayîn

Hut: şîşko, qelew

Ûyêh: tê wateya ‘ hele li wî mêze!’

Ka tu çi gû dixwey: tê wateya tu çi dikî?

Kelkelo: ji kesên pir diaxifin re tê gotin.

Kelleboş: ehmeq, ker

Kello: keçel

Kene: pere

Kepira wê mêze: ji keçikên ku porên wan dirêj û belavela ne re tê gotin.

Kepîre yatmax: xwe çivçivandin, ji kar revîn

Kerkelez: tê wateya “hele li wî binere “

Kêş: esrarkêş.

Kewaşe: qeşmer, sûtik, tolaz,

Kirk ayakh: beredayî, serserî

Kîrê min: tê wateya neqebulkirinê

Kiro: kesên ku cahil in û bi perên xwe forsa xwe davêjin.

Kîrquz: tolaz, doxinsist

Korfehm: fehmkor

Korfîstan: tesadûf

Koro: tê wateya kor.

Kotikçî: miftexur

Kûft olmax: -

Kundir çû hundir: -

Kundir oxlî kundir: ji zarokên şîrîn re tê gotin

Kurê kere: deşik, mezin ji zarokan re dibêjin

Kurmî: kesên ku diranên wan tuneye, rizî

Küft olmuş: westîyayî

Lacek: kurrik, lawik

Lahpo: tiral, tembel

Lalo: mêtên ku zimanên wan tune.

Latişî: -

Latişîyo: -

Lawik: îbne

Lehpe olmax: tiralbûyîn

Lehpo: tiral, tembel

Lêvtorbe: kesên ku lêvên wan mezin in.

Lox gîbî olmax: -

Mala mînê erzîncan: tê wateya wax wax

Malo: ji mêtên ehmeq re tê gotin.

Mehne: hêcet, bihane

Memenat: -

Mirtiv: çîngene

Mişko: ji bo kesê ku qama wî biçûk e tê bikaranîn

Muxul: hesûdî kirin

Miuz: muhtaç, hewcedar

Nahiregogo: di lîstikeke de kesê/a dawîn

Namis olmîş bexdenûs: namis erzan bûye, bênamis

Nefsek: kesên ku li pir li pey nefsa xwe digere

Nehlet gelsin: nehlet hatin

Nehne yapmax: tevlihev kirin

Nermik: îbne, qûnek,

Nermikê kayê: xapîner, fêlbaz

Nermo: îbne, qûnek, tirsonek

Nono: di axaftina zarokan de tê wateya cil, kinc

Nûtik: îbne,

Osirtmax: îfadeya tehdîtîkirinê ye, peyivandin

Oxlan: îbne

Oxlanbêş: îbne

Papağ: serpûş

Papo: di axaftina zarokan de tê wateya pêlav

Pepuk olmax: xulambûyîn

Pepü(k) hatun: jina jêhatî

Pêxwas: serseri, sûte

Pitpito: Geveze

Pitpit etme: tê wateya ‘zêde xeber nede’

Pîrebok: ji keçen ku porê wan vekirî û belawela ne re tê gotin.

Pirêze Meheme: ji kesên ku derewan dike re tê gotin.

Pirêze: derew

Pirêzecî: ji kesên ku derewan dike re tê gotin.

Pirpirik toximî: ji sebîyên ku hejmarên wan zêde ne re tê gotin.

Pîslîx: kesên ku nepaqij e.

Pîvaz: ji Zazayan re tê gotin.

Potî dawuxa olmax:

Pozkundir: ji kesên pozmezin re tê gotin

Qablama: dualî, durû, riyakar

Qawat: pzevenk

Qazma: kesê ku vala, tenê, nezan

Qebrax: qeşmer, mesqere, sût

Qeda bela hesen Axa: tiştê ku bê serê me em ê bikişînin²⁰

Qeda li te keve: xwedê bela te bide

Qeleş: bêbext, bêwijdan

Qeraçî: mirtiv, çingene

Qerez: serhişkî, kerb

Qeşmer: sût, soyterî,

Qicix girtin: ji kesekî re hêrsbûyîn

Qicixcî: kesên ku bi tevgerên xwe derdora xwe hêrs dikin

Qilopilo: delewêre

Qinik: kesên ku bêjna wî/ê qin ,biçûçik

Qirtik: hûrhûrkî, biçûçik

Qortikina koymax: niyandim, gan, kutan,

Qotê qot: kêmendami, kûd, qot

²⁰ Mustafa Gazi, , *Diyarbakır Türkçesi Memleketten Êlesine Yansımalar*. Do Yayınları, 2006, r. 35

Qotikçî: miftexur, beleşçî

Qoto: ji bo mêran tê bikaranîn tê wateya kêmendî, kûd, qot

Qulikê te nim: dijûn e.

Qûna rût tembûrê dixwaze: -

Qûnde: îbne

Qundirê tirşe: ji bo sebîyên şîrîn tê bikaranîn

Qûnek: îbne

Qûnmezî: kesên ku qûna wan mezin in.

Qûşa min qetiya: tê maneya ez pir westîyam

Quşxane: kesên wala ,

Quzê wê dişewite: har bûyîn

Reben: belengaz

Rêya mêrdînê: kerxaneya Amedê

Rûto: bêpere, keçel, xîzan

Selexanecî: nermijok, miskin, pelepoşîn

Sende beluhe var: pir bişans

Serçuçik: kesên ku serê wî/ê biçûk in

Serhişk: kesên ku ji ya xwe nayên xwarê, kesên ku ti tişt fehm nakin

Sermezî: kesên ku serê wan mezin e.

Serpetix: kesên ku serê wan dişibin petixê.

Serqot: serê ku porr nehatiye veşartin,

Serqundir: kesên ku serê wan mezin e.

Serwehş: kesên ku serê wan mezin in.

Seryano: -

Sîpe: ji bo zarokên beredayî re tê bikaranîn

Sixûr: ajan, diznêr

Sotalî yêr: cihên ne ewle

Sûtik: qeşmer, tolaz pîranî ji bo keçikan tê bikaranîn

Şanpaz: tolaz

Şaşo: kesên ku çavên wan şaş mêze dikin.

Şaşobêş: kesên ku çavên wan şaş mêze dikin,

Şatek: kesên ku di binê xwe da dikin

Şatir: beleban, nehs

Şato: -

Şebşebok: navê ajalek e.

Şefaquzî olmax: nexweşiya ‘Tavukkarası’

Şeşbêş: kesên ku çawên wan şaş in.

Şilkim rakim têrakim: ji bo kutandinê tê bikaranîn.

Şît: çavbel, qurnaz

Şorik: gilêz, avşûtik

Tango: jinên rehet, fetan, fitoş, şeng

Tankêr: ji kesên qelew re tê gotin.

Tantax: qûn

Tavli: şîşko, qelew

Tawax: -

Teberik: pîroz, mibarek

Teklamba: kesên ku tenê ne, têkiliyên wan bi zêdan kesan re tuneye.

Teneke: kesên wala

Teqlecî: fêlbaz

Teqlo meqlo: karên ku carna baş carna xirab dibin

Teşqele: pirsgirek, heytehol, helahela

Tew tew: hey lo lo

Tewşo mewşo: axaftina bê wate

Tezek: ji rêxê çêdibe, sergîn, ji mirovan di dewsa çêr de jê tê gotin.

Tîpo: bêşimşat

Tirê: tirsonek, newêrek, ji keçikan re tê gotin

Tirigê gîtmîş virigê kalmîş: tişteke jê nemaye²¹

Tirigînê çikarmax: fişal kirin, çirçirandin

Tirrek: tirsonek

Tirsonekê çavê belek: newêrek, tirsonek

Tirşikçê: simsik, miftexur, belaşxur

Tirşo: kesên ku rûyê wan her tim mehdekirî ne.

²¹ Edip Sevgican, *Diyarbakır Ağzı(Kelimeler)*,2014, <http://www.salihtas.net/?Syf=22&Mkl=632000>, (17.07.2018)

Tolaz: kesên ku zehf li pey jinan digerin.

Topo: îbne

Tu mêt î kes tune bide binê te: ji kesên derewkar re tê gotin

Tûjo: kesên ku zû hêrs dibin.

Vêr qoltixina siç gorina: melaqî bûn, şelaqî bûn

Vêregen: îbne, qûnek

Viş kele: nişandana ecêbmayînê

Vidvidok: kesê/a ku sir û razan venaşêre, kesê/a ku pir diaxife.

Virtigot: bêsexber, destbelav

Wahş: ajalek, beraz

Wla heno: -

Xayin: kesê/a ku pêre niyetên xerab hene.

Xêf: saf

Xefîf: kesê/a ku xwe zû berdide.

Xêrê başina ola gorênde dîk otura:-

Xêvo: awel, enayî

Xewar: kesê/a ku zêde radikeve.

Xeyrî: awel, mal, ehmeq

Ximbil: himbil bûn, betî bûn

Xinzîr: kesê dilhişk,

Xirbo: qeşmer

Xirê min: ji bo nîşanda gotina ku neye qebulkirin tê gotin.

Xirik:-

Xirnik: lîk, lîçik

Xirpo: kerkel, devdeve, selexane

Xirxote: erebeyên ku pir caran xera dibe yan ariza dide

Xiş etmex: canê yekî derxistin

Xiyar: enayî, fistoq

Xîzan: berdûş

Xopano: kesên xirabbûyî, kesên kuz û tîn xapandin

Yampîrî yampîrî: çelexwarî, xwaromaro

Yamsiz: -

Yarrax: organê cinsî yê zilaman

Yawrî: ji bo laf avêtina jinan tê bikaranîn

Yawûşax: nûtik

Yêtim: feqîr, belengaz

Yirtix: bêar, bêşerm

Yomsiz: bêyom, bêoxir

Zantari: derd, xem

Zaza: serhişk

Zebeleh: mirovê gelek kelex mezin û dirêj

Zexel: tiral, tembel

Zikkum: jehr

Ziknebut: jehr û ziqûm

Zillût: zigurd, xizanmayîn

Zibil: sergo

Ziblo: -

Ziktorbe: kesê/a pir xwarin dixwe.

Zikzebeş: kesê/a ku zikê wî/ê pir mezin e.

Zillenmañ: Yaşlı bir insanın genç imiş gibi karşı cinsle ilgilenmesi

Zillut: -

Zîmzûk vurmax: kulm lê xistin

Zirto: kesê bêedep, bêpîr

Zirtoya walla bîlla: ji kesê bêedep re tê gotin.

Zîrzop: hirhop, zuppe

Zîtik avêtin: lotik avêtin

Zûdde: sef, xwerû

Zûla êtmax: Veşartin, istif kirin

ENCAM

Argo wek beşeke folklorê ye û di nav folklorê kurdî de jî cihekê girîng digire. Ji encamên polîtîkayên tûnebûnê, folklorê Kurdî jî para xwe girtiye û her ku çûye di jiyana rojane de kêmtir hatiye bikaranîn. Jî şert û mercên rewşa Kurdistanê û polîtîqayên dewletên serdest ev îmkân nedaye ku folklorê Kurdî di rêya xwe ya xweser de biherike. Lewma jî me di berhevkarîya ku di qadê de dikir dît e ku; argoya Kurdî her ku diçe xwezayî ya xwe hinda dike û ber bi Tirkî ve diqûlûbe. Loma jî di navbera argoya ciwan û êxtiyara da hin ciyawazbûn xwe dide der. Helbet ev jî bi zimanê fikirandina hiş û aqil ve girêdaye. Xûya ye ku di tatbîqkirina Kurdî de, di navbera nîfşa de, ne heman e û hin guhertin pêk hatine.

Di vê xebatê de hat dît ku argoya kurdî windanebuye lê bi zimanê ku li derdorê ye an jî zimanê fermî yê serdest re kirasekî nû girtiye. Argoya ku tê bikaranîn ji gelek alîyan ve dewlemendiya xwe nîşan dide. Lewre tê dît ku hin peyv di nav ciwanan de tê bikaranîn û bo ciwana wateyên kûr îfade dike. Heman tişt bo êxtiyara jî an ji bo pêkhatiyên din jî gerguhez e.

Niha piştê vê xebatê me dît ku di devoka Amedê de gelek peyvên argo tên bikaranîn. Elbet argoyên bajarên din jî hene li qeweta min nedigihîşt hemûyan kom bikim ji ber vê min tenê bi herêma Amedê ve sînordar kir. Herêma Amedê hat nasandin paşê li ser ziman agahî hat dayîn, herî dawî argoyên ku li Amedê tên bikaranîn hat nîvîsandin û wateya wan hat dîyar kirin. Elbet di xebata min de hin kêmasî hene. Divê bo pêşerojê ev xebat were xurt kirin û ne tenê herêma Amedê li herêmên din jî ev xebat were kirin.

ÇAVKANÎ

BÜLBÜL, Abdulkerim, “Kürtçe Şarkılar Nasıl Türkçe Oldu?” 9 ê Îlonê 2011, <http://www.derindusunce.org/2011/09/09/kurtce-sarkilar-nasil-turkce-oldu/> (10.07.2018)

Kolektif, “Argo” Ana Britanicca Genel Kültür Ansiklopedisi, c.2, 266-267, Ana Yayıncılık, 1990

BEDIRXAN, Celadet, *Ferhengok*, Hawar, hejmar: 30, Şam, 1941

AYDIN, Suavi, *Halk Bilimi Sözlü Anlatımla*, 2009, T.C. Kültür Ve Turizm Bakanlığı Türkiye Kültür Portalı Projesi https://www.kulturportali.gov.tr/Common/DownloadFile.aspx?f=1.SzlAnlatmlar_20151230104856114.pdf (17.07.2018)

KAYA, Doğan, *Ansiklopedik Türk Halk Edebiyatı Terimleri Sözlüğü*, Weş. Akçağ, Ankara, 2007

SEVGİCAN, Edip, *Diyarbakır Ağzı (Kelimeler)*, 2014, <http://www.salihtas.net/?Syf=22&Mkl=632000>, (17.07.2018)

AKTUNÇ, Hulki, *Türkçenin Büyük Argo Sözlüğü*, İstanbul: Yapı Kredi Yayınları, 1998

AKINCI, Murat, *Açıklamalı Edebiyat Terimleri Sözlüğü*, 2007, <https://www.turkedebiyati.org/argo-sozlugu.html> (05.06.2018)

KEMALOĞLU, Nasir, *Zaravayên Kurdî*, BasNews-Nûçe, <http://candname.com/zaravayen-kurdi-2/> (04.06.2018) Hejmar: 92,

TERZİOĞLU, Öykü, (2006) *Anonim Bir Halk Edebiyatı Ürünü Olarak Argo*, *Milli Folklor Dergisi*, Sayı.71, 102-104, <http://www.millifolklor.com/PdfViewer.aspx?Sayi=71&Sayfa=109> (17.07.2018)

YILDIRIM, Kadri, Ramazan PERTEV, Mustafa ASLAN, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü, Mardin, 2013.

CLARKE, Robert, *Naissance de l’Homme*, Weşanxana Editions du Seuil, Paris, 1980.

EKİCİGİL, Sevgi, *Türk Edebiyatında Argo*, 2014, <http://www.eskimeyenkitaplar.com/turk-edebiyatinda-argo/> (05.06.2018)

Türk Dil Kurumu, ‘‘Argo’’,

http://tdk.gov.tr/index.php?option=com_gts&arama=gts&guid=TDK.GTS.5b4f169ef01200.00252042 (18.07.2018)

PROPP, Vladimir, *Teorî ve Tarih*. Weşanên Avesta. Stenbol, 2001.

Diyarbakır İl Kültür Ve Turizm Müdürlüğü, Diyarbakır, 2018

<http://www.diyarbakirkulturturizm.gov.tr/TR,56880/genel-bilgiler.html> (17.07.2018)

GAZİ, Mustafa, *Diyarbakır Türkçesi Memleketten Êlesine Yansımalar*, Do Yayınları, 2006

HASPOLAT, Yusuf Kenan, *Diyarbakır Sosyokültürel Tarihi 1*, Dicle Üniversitesi Diyarbakır, 2013